

Efrîn.. Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî firneyek ji bo ziyandîtiyên erdhejê vekir



Kurdistan

Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî firneyek li bajarê Efrîn ji bo ziyandîtiyên erdhejê vekir ku dê nan beramber li xelkê bê

belavkirin. Berpirsê alîkariyên Dezgehê Xêrxwazî ya Barzanî ji bo Efrîn û Cindirêsê Rewac Hacî got: “Piştî zêdetir ji karê me yê li Efrînê, wan projeyeke nû ji bo ziyandîtiyên

erdhejê li Efrînê vekir. Firneyek dê rojane 4 ton ard dê ji wan re bike nan û ewê bê beramber li xelkê belav bike.” Da zanîn jî, proseya beşavkirin nan dê bi riya

muxtarên taxên bajêr û gundan re be û got: “Vekirina vê firneyê cihê dilxweşiya xelkê Efrînê ye, ji ber ku projeyeke giring e, bi taybet di vê qonaxê de. Piştî erdhejê,

Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî wek yekem aliyê xêrxwaziyê gihîşt Efrînê û alîkariyên mirovî û bijîşkî li ser ziyandîtiyên erdhejê belav kirin.

19 sal bi ser serhildana 12ê Adarê re derbas dibin

Rûpel—2

Destkeftên heyî ji encama Rêkeftina 11ê Adarê ne

Rûpel—3

Mihemed Şêxo, dengêkî zindî di guhê her Kurdekî de

Rûpel—4

19 sal bi ser serhildana 12ê Adarê re derbas dibin

Kurdistan

Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) îro di salvegera Serhildana 12ê Adarê û Roja Şehîdên Kurd de tekeziyê li parastina mafên gelê Kurd ên rewa di Sûriyayeke federal, demokrat, firehnetew û firehol de dike. Sekreteriya Giştî ya ENKSê îro 12ê Adara 2023an peyamek bi boneya Serhildana 12ê Adara 2004an û Roja Şehîdên Kurd belav kir û tê de ragihand, îro 19 sal di ser serhildana 12ê Adara 2004an a pîroz re derbas dibin ku hêzên rejîma Sûriyê komkujiyeye hovane li dijî gelê me yê Kurd li Sûriyê pêk anî, weke êrîşeke pêşilêgirtinê li dijî têkoşîna netewî ya Kurd, ew jî piştî pêşketinên wê demê yên li herêmê, piştî

rûxandina rejîma diktator a xwînrej li Iraqê û ji bo çêkirina nakokiyên di navbera gelên gelên Ereb û Kurd de." ENKSê di daxuyaniya xwe de got "Rêjîmê sûde ji lîstika futbolê ya di navbera her du tîmên Qamişlo û Dêrezorê de wergirt û bi guleyên rasterast li ciwanên Kurd ên li stadyumê reşandin. Her wiha roja din jî di dema merasîma oxirkirina şehîdan de, hejmara şehîdan zêdetir bû ku û ev yek bû sedema derketina serhildana gelê Kurd li hemû deverên Kurdan li Sûriyê, ji Dêrikê heta Efrîn, Heleb û Şamê." Di daxuyaniyê de hat gotin: "Gelê Kurd di dîroka têkoşîna xwe de, bi riya serhildan û şoreşan, qurbanîyên giran ji bo azadiyê dane, ji wan jî şehîdên Serhildana

Adara 2004ê ku xwîna wan a pak bû handereke mezin ji bo tevgera rizgarîxwaz a Kurd li Sûriyê û ji bo pêşketina doza Kurdî ku derbasî qonaxeke nû ya têkoşînê li Kurdistana Sûriyê bû û pîrsgirêka Kurd ji çarçoveya xwe ya herêmî ya teng ber bi asoyên navneteweyî ve bir û xiste rêza mijarên girîng ên Rojhilata Navîn." Her wiha got: "ENKSê ev roj ji bo şehîdên Kurd li Kurdistana Sûriyê ji bo rêzgirtina li xwîna wan a pak hîlbijart. Bila ev roj wek navekî girîng di dîroka gelê me û doza wî ya niştimanî de bimîne, ji ber ku şehîd pira ku karwanên azadiyê di ser re derbas dibin e." ENKSê di beşeke din a peyama xwe de dibêje, "Di vê boneya bi êş de, ENKS tekezî li ser



pêwîstiya yekdengî û yekhelwestiya Kurdî li hember pîrsên niştimanî, çarenivîs û daxwazên gelê me yê Kurd dike û ew berdewam e di berevanîkirina li hebûna xwe ya resen li Sûriyê û mafên xwe yê çarenivîsaz ên rewa di Sûriyayeke federal, demokrat, firehnetew û firehol de ku mafên hemû pêkhateyên gelê Sûriyê di destûra wê de

parastî bin." ENKSê di dawîya peyama xwe de amaje bi erdheja wêranker a 6ê Sibata borî li Bakur û Rojavayê Kurdistanê, Tirkîye û Sûriyê dike û hevxiyê xwe ya kûr bi gelên Sûriyê û Tirkîyê re û bi taybetî bajarên Efrîn û Cendirsê re nîşan dide. Her wiha dilovaniya ji şehîdan re û başbûna bilez jî ji birîndaran re hêvî dike.

Qamişlo Kela Berxwedanê



Kurdistan-Hêvî Delî

Her sal 12ê Adarê çîroka şehîdên raperîna Qamişlo ya 2004an, bi dilekî Xemgîn û azar di nava kurdan de tê bi bîranîn ,ku xwîn û wêneyên wan bi tîpên zêrîn li ser dîwaran hatiye nivîsandin û di dilê her kurdekî de bi zindî hatiye tomarkirin..Û di derbarî 19emîn salvegera 12ê Avdarê endamê

komîteya Herêmî li Kampa Kewiregoskê M,Ebdulrehman Se'îdê" ji rojnameya kurdistan re got: Bi vexistina mûman û bilindkirina wêneyên pakrewanên raperîna Qamişlo ya 12ê adarê bi dilsozî li bîra xwe tînin,weku wefadarî û rêzgirtin ji canê hemû qurbanîyan yê ku canê xwe kirina fîda ji bo Azadî û parastina mafê miletê kurd..Û herwiha

berdewam kir ku 19 Sal bi ser raperîna Qamişlo ya 12ê Adara 2004an, re derbas dibe ku hemû gelê kurd li tevaya bajarên kurdî serî hildan û li dijî rêjîma Beis ya Esed ê rabûn, û di encama vê sehildanê de hejmarek mezin ji xelkê Rojavayê kurdistanê ji aliyê hêzên ewlehiyê yê Sûriyê şehîd û birîndar ketin û bi hezaran jî hatin girtin û bin çavkirin...Û soza me li ser rêya pakrewanan bi şopînin û xwîna wan ji bîrnakin ...Û herwiha rexekî din ve ,Çalakvan ,Cîhad Osman " ji rojnameya kurdistan re wiha got: Ku "12" Adarê rojek taybet di dîroka miletê kurd de ku ew roja destpêkirina Azadiya gelan li Rojavayê kurdistanê bû ,ku gelê kurd darê zilm û zordarî û tirsê şikand ji Qamişlo

heta Efrînê bi yek dengî doza Azadiyê û mafê xwe kirin Û tê zanîn yekem car çirûskên serhildana roja 12"Avdara" 2004" an de,li bajarê Qamişlo destpêkir ,di lîstika futbolê de, di navbera Tîma Cîhad ya Qamişlo, û Tîma Fitiwê ya Dêrezorê, ku alîgirên Tîma Fitiwê yê erebên şofînî û bi piştgiirtiya rêjîma Esed bi hin çekên curbicur êrîş bi ser welatîyên kurd ên alîgirê Tîma Cîhad kirin. Û di encama wê serhildanê de de bi dihan kes şehîd û birîndar bûn û herwiha hezaran ciwan û çalakvan û siyasatmedar jî ji aliyê rêjîma Beis ve hatin binçavkirin, û eşkencedan... ji ber vê yekê li seranserî bajar û bajarokên kurdan bi hezaran welatîyên kurd daketin xwepêşendanan

li dijî rêjîma Beis ya Esed kirin serhildan û ev yek di bin dirûşm û siloganiyên azadiyê bilindkirin û piştgirî û dilsoziya xwe ji bo Qamişlo nîşan dan.. Û hêjaya were gotin ku her sal êvara "12 ê "Avdarê de, mûm tèn vexistin li pêşiya mal û kolanên bajêr, di roja serhildanê de jî tevahiya miletê kurd li herçar parçeyên kurdistanê li kolanan radiwestin weku rêzgirtinek ji canê hemû qurbanîyan re û wê ku her tim di dîroka me de cîh bigire... Lê ev kiriyarên ku derheqê kurdan de hat kirin ji aliyê rêjîma sitimkar a Esed, nikarîbun vîna gelê Kurd bişkîne û di têkoşîna xwe de berdewam kirin ta bidestxistina mafê kurdan li kurdistana Sûriyê...

Destkeftên heyî ji encama Rêkeftina 11ê Adarê ne



Kurdistan

53 sal beriya niha, di 11ê Adara 1970an de bi serokatiya Mistefa Barzanî rêkeftineke dîrokî di navbera gelê Kurd û hikûmeta Iraqê de hat îmzekirin, bi awayekî ku daxwazên şoreş û gelê Kurdistanê pêk hatibûn. Ew rêkeftin û nasîna mafên Kurdan, bûbû havêna beşeke mezin a destkeftên li pey wê. Rêkeftin ji 15 xalan pêk dihat, xalên herî girîng, nasîna mafê otonomiyê ya Başûrê Kurdistanê bû, tevî wê zimanê Kurdî li dibistanan were xwendin, ew cara ewil bû ku hikûmeta Iraqê mafên gelê Kurdistanê dida.

Xalên herî girîng ên Rêkeftina 11ê Adarê:

- Pirs Kurd di destûra demkî ya Iraqê de.
- Di destûrê de weke neteweya Ereb neteweya Kurd jî were nasîn.
- Gelê Iraqê ji du neteweyên sereke pêk tê, neteweya Ereb û neteweya Kurd, di destûrê de mafên netewî yên Kurdan û mafên hemû kêmneteweyan hat nasîn di çarçoveya yekîtiya Iraqê de.
- Zimanê Kurdî li cem

zimanê Erebî, li deverên ku piraniya nişteciyên wan Kurd in, bû zimanê perwerdehî û fêrkirinê.

- Divê cîgirekî Serokomar Kurd be.
- Gelê Kurd bi rêjeya nişteciyên xwe li gor nişteciyên Iraqê, beşdarî desthilata yasan bibê.
- Ji bo Kurdan otonomî
- Beşdarbûna Kurdan di desthilatê de û nekirina cudakariyê di navbera Kurd û Ereban de.
- Ji ber dîrxistina wan di rabirdûyê de Kurdan ji perwerde û fêrkirinê zirar dîtine, ji vî alî ve planek ji bo çareserkirina vê kêşeyê were danîn.
- Ji bo deverên otonomiyê serjimêrî were kirin.
- Vegerandina xwendekarên ku ji dibistanan hatine dîrxistin, an ji ber tundiya li deverên xwe, neçar bûne ku dev ji xwendinê berdin.
- Li televîzyonên hikûmetê weşana bernameyan bi zimanê Kurdî jî hebin û girîng werin dayîn.
- Qebûlkirina xwendekarên Kurd li zanîngeh û peymangehan û

dayîna derfeta xwendinê bi rêjeyeke adilane li derve û li navxwe.

- Berpirs û fermanberên li yekeyên îdarî ku piraniya wan Kurd in, divê Kurd bin, an ji wan kesan bin ku Kurdî baş dizanin.
- Vegerandina Kurdan bo erd û zeviyên xwe û cihên ku berê lê bûn.
- Bilezkirina pêkanîna yasaya çaksaziya çandiniyê li Kurdistanê û sererastkirina bi awayekî ku paktawkirina pêwendiyên derebegî misoger bike û hemû cotkar parçeyên erdên guncaw ji wan re werin dayîn.

Rêkeftina 11ê Adarê destkefteke girîng a Şoreşa Îlonê û xweragirî û qurbanîdana gelê Kurdistanê bû bi rêberiya Mistefa Barzanî ji bo mafên rewa. Ew rêkeftin bûye belgenameyêke yasayî û dîrokî û kevirê bingehê yê hemû destkeftên ku piştê ji bo gelê Kurdistanê pêk hatin.

Serok Mesûd Barzanî bi boneya salvegera Rêkeftina 11ê Adarê peyamek belav kir û ragihand:

Rêkeftina 11ê Adarê

yek ji destkeftên giranbiha yên tevgera rizgarîxwaz a gelê Kurdistanê ye.

Girîngiya vê bûyera dîrokî di wê de ye ku di encama xebat û şoreşa gelê Kurdistanê û PDKê de bi rêberiya Barzanî, rejîma wê demê ya Iraqê hat neçarkirin ku di 11ê Adara 1970 de bo cara yekem û bi awayekî fermî, beşek ji mafên gelê me nas bike. Ew mafên ku her ji destpêka dirustbûna dewleta Iraqê ve, dihatin înkarkirin û zeftkirin.

Rêkeftina 11ê Adarê ku berhema xebat û qurbanîdana Pêşmerge û cemawer û hemû çîn û pêkhatyên olî û neteweyên Kurdistanê bû, pênase û hebûna gelê Kurdistanê li nav dewleta Iraqê bire qonaxêke bilindtir û baweriya bi xwe li nav takekesê Kurdistanî bihêztir kir. Lê belê rejîma Iraqê piştê xwe li mafên xelkê Kurdistanê kir û rêkeftina 11ê Adarê bînpê kir, lê ew destkeft deriyek bû ji bo qonax û pêngavên mezintir ên xebata gelê me û pêkanîna destkeft û serkeftinên zêdetir. Di pênçî û sêyemîn salvegera Rêkeftina 11ê Adarê de tevî ku em tekezî li peyama aştxwazî û pêkvejiyana gelê Kurdistanê dikin, em wê yekê jî tînin bîra her kesî ku gelê Kurdistanê di bin ti rewş û guvaşê de ji maf û azadî û destkeftên xwe paşve venakişe.

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr

Barzanî di salvegera Rêkeftina 11ê Adarê de peyamek belav kir û ragihand, Em îro rêkeftina 11ê Adarê bi bîr tînin, ku pênçî û sê sal berê, hikûmeta Iraqê neçar bû, ji ber berevanî û xweragiriya xelkê Kurdistanê di şoreşa mezin a Îlonê de bi rêberiya Barzaniyê Nemir, wê rêkeftinê îmze bike û hinek daxwazên gelê Kurdistanê nas bike.

Rêkeftina 11ê Adara 1970, destkefteke girîng a gelê Kurdistanê ye û belgenameyêke dîrokî ye, li ser serkeftina xwasta xelkê Kurdistanê û peyama xwe ya aştxwaz, ku her dem xwestiye bi rêya danûstandin û gotûbêj û rêya çareseriyê ya aştiyane, kêşe werin çaresekirin.

Lê belê mixabin hikûmeta wê demê ya Iraqê, ji soz û rêkeftina xwe ya ligel serkirdetiya Kurdistanê paşgez bû û dest bi êrîşkirina Kurdistanê kir û di encamê de ji ber siyaseta şerxwazî ya rejîma Iraqê, Herêma Kurdistanê û Iraqê bi giştî, rûbirûyî şer û wêrankarî û karesata mezin bûye, ku heta niha jî xelkê Herêma Kurdistanê, ji destê wan tawanên dinalin û nehatine qerebûkirin. Di vê bîranînê de, em helwesta xwe ya dakokîkirin û destneberdana ji mafên xwe yên destûrî û çareserkirina kêşeyan bi awayekî bingehîn û aştiyane û li ser bingeha destûrê, dubare dikin.


Mihemed Şêxo, dengê zindî di guhê her Kurdekî de

Kurdistan

Hunermendê navdar Mihemed Şêxo ku bi stranên xwe her zindî ye û li her çar parçeyên Kurdistanê gerayîye, ji bo bîranîna wî li Kurdistana Sûriyê her sal xelk serî li gora wî didin.

34 sal di ser koça dawî ya hunermendê Kurd Mihemed Şêxo re derbas dibin, ew xwediyê stranên evînî û netewî, stranên bi navên Ay Lê Gulê û Nisrînê û Dil Perîşan im. Hunermendê Kurdê navdar Mihemed Şêxo di sala 1948an li gundê Girbawî yê Qamişloyê jidayîk bûye. Navê wî yê rastî Mihemed Salih Şêxmûs e. Di zarokatiya wî de

malbata wî koçber dibe û li gundê Xecokê bi cîh dibe. Di sala 1959an de dest bi xwendinê dike, di salên xwe yê dibistanê de Mihemed Şêxo gelek hunermendên Kurd nas dikir. Ji bandora wan nêzikî muzîkê dibe û di sala 1969an de dest bi dengbêjiyê kiribû. Mihemed Şêxo li Başûr û Rojhilat jî xwedî xebatekî bû. Li Başûr tevî pêşmergeyan bûbû. Mihemed Şêxo di 9ê adara 1989an de çû li ser dilovaniya Xwedê. Di cenazeyê wî de jî zêdeyî ji 70 hezar kes beşdar bûbûn. Salên xwe yên di navbera 1969 û 1972yan li Libnanê ji bo xizmeta hunerê terxan kir û li Bêrûtê




du sal dersên muzîkê stand. Di sala 1972an de bi hinek hevalên re Koma Serkeftin ya muzîkê damezrand. Mihemed Şêxo 1973an de derbasî Başûrê Kurdistanê bû. Têkiliyê xwe bi hunermendê Kurdên ên din re xurt kir. Paşê çû Şamê û li wir kasete xwe ya bi navê Ay Gewrê derxist.

Lê li wir dewleta Sûriyê astengî jêre çêkirin û gelek caran hate girtin. Mihemed Şêxo careke din vegeriya Başûrê Kurdistanê û tevî rêzên Pêşmerge bû, lê bi têkçûna serhildana Başûr ew ji bo Rojhilat hate sirgûnkirin. Li Rojhilatê Kurdistanê ji bilî karê xwe yê

muzîkê çend sala mamostetiyê jî kir. Demek şûnda rejîma Îranê jî Şêxo wek dijberê rejimê hejmart û derheqê wî de biryara binçavkirinê da. Ji ber wê yekê Mihemed Şêxo piştî 11 salan carek din berê xwe da Sûriyê û li wir bi hezkirineke mezin tê pêşwazîkirin.

Giringiya 21ê Adarê



Babîsok Amûdê

Bê guman, her miletek yan her netewek bi ziman, kiltûr, dîrok û çanda xwe xuya ye herwiha li pêş e çimkî ev tişt xal ên serekene di pêşxistina miletekî de. Ji nava wan milletên ku li cîhanê belav in (Gelê Kurde) Yên ku li seranserî cîhanê belav û hene. Gelê Kurd yek ji gelên herî kevnar e di nava dîrokê de pencemora vî gelî berze û eşkere ye tu kes nikarî vê yekê mebêje, çimkî yên pêşend û yekemîn in li gerdûn û cîhanê, zengîne bi hemû tiştên

ku jiyana yan alim dixwaze gihiştîye asta yan pileya herî mezin bi vê yekê lê em çikin bin destiyê xwe li ser canê me daniye ev jî bela ku em bê itîfaqin ji ber vê yekê hêja ye gotinê ku ji mêjve yan ji destpêka mirovatiyê ev gel xwe çemandin ne dîtîye yan xwe li bin asta tenahiye qebûl kiriye , em tim û dayim serbilind û aza dijîn bi fikir û ramanên cur bi cur çimkî nûderiyên baş li cem me hene bi çand û rewîştên kurdewarî bi xebat û têkoşînek e rasteqîn, yek ji nepijirandinê bindestiyên yan xwe ne çemandinê ew e Roja 21 Avdarê anku Roja Azadî û felatê, sersala Kurdan (Nûroj) Newroz ya ku

dinya hemî pê dizanî bê çiyê li ba me. Ev roj Rojek e bê hempaye û tu rojî dî wek e wê nehatiye afirandin çimkî Kurd hemî pêv girêdaye wek e rojek e pîroz wê dibînin bê guman wisaye girîngtirîn taybetmendiyên Kurdan tede peyda dibe mînak cil û bergê filiklorî buhar nû govend û dîlanên gelêrî deng û nîşanên azadiyê ev hemî dikeve di bin sîwana Newrozê de û gelek tiştên dîtir jî lê me bi kurtasî anîn ziman. 21 ê Avdarê ji her salê sersala meye ya ku bi destê Efsanê dilêr Kawayê Hesinkar hatiye avakirin ku zordest û Stemkarê demê hate Kuştin Zehaqê Xwînmij yê ku xwe didît Şahê tu

kes pê nikarî lê ji ber ne erê kirina bindestiyê weke tak gihayê ji xakê derkeve wisa Gelê Kurd serê xwe rakir û berxwedan kir ta ku we zilim nemîne û millet di bin wê de neji ji lewra agirê serhildanê hate vexistin anku hate nîşankirin wek e tabloyekê yan nîşanek e felatî û berxwedêr, rojek e ji herî rojên xweş in di nava salê de çimkî em maf û doza xwe tede dibînin ji lewma vê rojê nimûneya yekîtî, serhildan, aşî, maf, wekhevîyê dibînin çimkî pêwîstiya wê ew e ku em tev pêve girêdayê ne û dijminên dorûberên me jê ditirsîn ji ber ku baş dizanin bê ew çiyê li cem me û bê çawa Kurd wê

dibînin ji lewra dexsaya vê yekê dikin ku bighêjin wê astê ya ku qirkirinê bikin lê pîlanên wan têk diçin bi saya agirê serhildanê û herwiha bi saya wî mijiyê ku ev roj lê hatiye çandin.

Newroza we tevan pîroz be

Bi gul û şilêr herwiha lîloz be

Hêviya Newrozek e bi xêr û xweş î bo hemî Gelê Kurd li seranserî cîhanê .

Ev narê sî qala dile Da'im li wê qala dile Newroz û sersala dile Weqtê hilîtin ew sirac Melayê Cizîrî